

Berlin, di 10. 1. 1992de

ZÎNETA ZIMANÎ DI NAVA HEREMÊN KURDÎ DE

Kurd di nava hin jimarêن Welatên Rojhilata Nêzîk de hatine belav kirin û ew dirêjbûneke zincîriyî mîna komekekê ji Xelkên bihev re pêktinin. Cihêن, ku Kurd têde rûdinin, bi pirbûna xwe çiyayî ne û sînorêن wan di nava Îranê, Turkiyê, Îraqê û Suryê de dikevin, her wehajî topraxa wan nêzîka (500. hezar Km Çargoşî derdikeve). Ew bi vî rengê hanê di nava Dewletêن jorî de li gora topraxê de tête parvekirin:

| | |
|-------------------|------------------------|
| Li Turkiyê nêzîka | 230. hezar Km. Çargoşî |
| Li Îranê nêzîka | 160. hezar Km. Çargoşî |
| Li Îraqê nêzîka | 75. hezar Km. Çargoşî |
| Li Suryê nêzîka | 15. hezar Km. Çargoşî |

Serjimara Kurdiyî giştî li gora kaniyêن Biyaniyî sala 1980 de (15 – 16) Milyon Kes derdikeve. Ew bi vî rengê hanê têtin belavkirin:

| | |
|------------|-------------------|
| Li Turkiyê | 7. 637 hezar Kes. |
| Li Îranê | 5. 933 hezar Kes. |
| Li Îraqê | 2. 570 hezar Kes. |
| Li Sûryê | 0.500 hezar Kes. |

Ev jimarêن hanê beramberî jimarêن (her wehajî texmînêن) di çapemeniyêن Sovyêtîyî sala 1977 de cudadibin, ku ew dibêjin: Serjimara Kurdayî giştî 8. Milyon Kes dike:

| | | |
|----------|------|-------------|
| Li Turki | 2 | Milyon Kes |
| Li Îranê | 3,2 | Milyon Kes |
| Li Îraqê | 2 | Milyon Kes |
| Li Sûryê | 0,45 | Milyon Kes. |

Li wan welatên gotî de Kurd mîna Kêmitîyeke Rehî (Milî) tête danin, ewanan endazêن ji sedê tên didin pêkanîn:

| | | |
|------------|--------|------------------|
| Li Turkiyê | 21,5 % | ji tevaya Xelkê, |
| Li Îranê | 18,3 % | ji tevaya Xelkê, |
| Li Îraqê | 27,5 % | ji tevaya Xelkê, |
| Li Sûryê | 9 % | ji tevaya Xelkê. |

Her wehajî piraniya pir ji Kurdan Musulmanê Sunî ne û li ser rêça Safîî ne. Li gora bîr û baweriya Zanevanêن zimanen de hiç gûman têde niye, ku zimanê Kurdî zimanekî azadî serbixwe ye, lêbelê ji ber zîneta zimêن, ya ku ew li Kurdistanê de heye, ev pirsiyariya hanê girngbûneke zor gewre werdigre; jiber bi serxwebûna zimanê Kurdî pê rûniştin û biryardan -weke pir Nivîsvanan daye xuyanîkirin – yanî di encam dawî de bi Miletikî tête rûniştin, ku ew ji aliyê Rehêve ji yên Serdarêن wan welatan tête cudakirin. Ji ber vê yeka hanê jî em di pêşîya rengan de ji bona hilandina Kurdan – (gerjî pêşîyêن wehajî bêtin